Bidestveanîna mafên neteweî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî



DI VÊ HEJMARÊ DE:

Peyama Hizba Dêmokratbi hilkefta terora Dr. Qasimlo...................... 2
Rojev ...................................... 7
Hevpeyvîn ............................... 8
Civakî ..................................... 10
Mafê Mirov .............................. 11

1 (522) Hejmar
2026-07-22

www.agirimedia.org

# Dîwarê me li ser cemedê nine û xîmê vê li ser koka erdê bab û kalên me ye




Li ser bingeha helwesta siyasî û neteweyî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, stratejiya vê Hizbê li hember pêşeroja Îranê û îhtîmala her cure guherîn an pevçûnan, li ser yekxistina hêza neteweyî û azadîxwestiyê rawestiyaye. Hizba Dêmokrat bi belavkirina rohnkirin û helwêsta xwe bo raya giştî, careke din siyaseta xwe ya zelal û pênasekirî li ser van guhertinên pêşbênîkirî da xuya.

Stratejiya sereke ya Hizba Dêmokrat li ser du stûnên bingehîn hatiye avakirin: sernixûniya tam a rêjîma Komara Îslamî ya Îranê û dengvedana daxwazên neteweyî yên gelê Kurd di Îrana siberojê de. Ji bo Hizba Dêmokrat, her cure pevçûn an nearamiyeke siyasî û leşkerî li herêmê, divê ne bibe sedema çone jêr pirsyarê a xebata xelkê û armanc û dirûşm û stratêjiya siyasî a Hizba Dêmokrat, belkî divê bibe derfetek bo xurtkirina tevgêra aliyên opozîsyonê û zêdekirina zextê li ser desthilata Tehranê.

Ev siyaseta neteweyî destnîşan dike ku paşeroja Îranê tenê bi riya rûxandina vê rêjîma dîktator û avakirina sîstemeke demokratîk, xwedî sitatoyekî federalî û azadîxwaz pêk tê. Hizba Dêmokrat balê dikşîne ser giringiya yekgirtina hêzên kurdistanî û hevkarîkirina bi opozîsyona azadîxwaz re ku baweriya wan bi mafên hemû neteweyên Îranê hebe.

Di encamê de, daxuyaniya Komîteya Pêwendiyan û peyama giştî ya partiyê zelal e: Xebata gelê Kurd ji bo bidestxistina mafên xwe yên reva û bo sernixûniya rêjîmê berdewam e. Ev tevger ne li benda bûyerên derve disekine û ne jî ji prensîbên xwe yên neteweyî paşve gav davêje, belkî bi stratejiyeke kûr û siyaseta kûr û dûrbînî, ji bo garantiya mafên xelkê Kurdistanê di pênşeroja Îranê de têkoşîna xwe berdewam dike.

Gele alî û sazî û heta opozîsyona rêjîma Îranê, renge bi avakirina kom û civînan li jêr navên cuda cuda de, gorî hewayê rojê siyasetê bikin û daxuyaniyan biweşînin, bêguman ev yêk renge tenê pêywendî bi wan û siyaseta wan xwe ve hebe, lê helwêstên Hizbekêk u xwe berpirsyar dibîne li hember xelkê û maf û daxwazên netewiye wan de, û weke pirensîpên xebatê tu carî wan hêlan pêpes nake û piştguh nayêxe, dide îsbatkirin ku xîmê vê tevgerê li temarên erdê de hatiye avakirin, û ne li ser cemedê be ku bi her ba û bahozekê cemed bihele û dîwar biherife.

## Civaka Îranê di Siya Şer de: Siyaseta Lawazkirinê û Derûniyeke Westiyayî




Di demekê de ku nûçeyên derbarê aloziyên leşkerî, agirbestên lawaz û îhtîmala ji nû ve destpêkirina şer serkêşiya rojevê dikin, ew kesên sivîl in ku ji her kesî zêdetir......

RUPELA 10

## Şer, bernameya etomî û pêşeroja Îranê, Çima siyasetên rêjîma Îranê kawilkar in?



careke din ev welat xistiye navenda yek ji metirsîdartirîn qeyranên Rojhilata Navîn. Gelek hikûmetên rojavayî û pisporên ewlehiyê di vê baweriyê de ne ku berdewamkirina bernameya etomî ......

RUPELA 7

## Gelo Qasimlo ligel daxwazên îro yên neteweya xwe dimeşiya?



Di gotûbêjeke dostane de, pirsek ji min hat kirin ku rengvedana yek ji girêkên siyasî yên herî girîng ên dîroka hemdem a Kurdistanê ye: «Doktor Qasimlo ku baweriya wî bi......

RUPELA 4

# Peyama Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 37 saliya terora Dr. Qasimlo û hevalên wî li Viyanayê



**Xelkê mafxwaz û xebatkar ê Kurdistanê!**

**Partî û aliyên siyasî yên Îran û Kurdistanê!**

**Kader, pêşmerge û endamên Hizba Dêmokrat!**

37 sal berê û di roja 22yê Pûşpera 1368an a rojî (13yê Tîrmeha 1989an a zayînî) de, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî kak Ebdullah Qadirî'azer, endamê Komîteya Navendî, li Viyanaya paytexta welatê Otrîşê, li ser maseya danûstandinê bi destê kesên bi navê dîplomat lê di rastiyê de terorîstên rejîma Komara Îslamî ya Îranê hatin şehîdkirin.

Terora dewletî ya Dr. Qasimlo bi destê desthilatdarên Komara Îslamî ya Îranê, yek ji wan bûyeran e ku di bîra gelê Kurdistanê de maye û dê bimîne jî. Hawar-birina Komara Îslamî ya Îranê ji bo terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo, îsbata wê rastiyê bû ku rejîmê şiyana rûbirûbûna li gel rêbaza siyasî ya Hizba Dêmokrat û tevgera neteweyî û dêmokratîk a Kurdistanê tune bû.

Lê desthilatdarên Komara Îslamî şaş bûn, çunkî terora Dr. Qasimlo ne tenê nebû sedema jinavbirina rêbaza fikrî û siyasî ya Dr. Qasimlo, belku em dibînin xebata neteweyî û mafxwazane ya kurd li Rojhilatê Kurdistanê wekî tevgereke giştî û girseyî û xwedî berheqiyekî dîrokî ya kûr û serdemiyane, di rêrewa xwe de berdewam e û roj bi roj berfirehtir dibe.

Dr. Qasimlo, ne tenê rêberekî partiyekê bû, belku zana û lêzanekî jêhatî bû ku bi pişt-girêdan bi paşxaneya akademîk û siyasî, çi bi teorî û çi bi kiryar, tevgera kurdî ji forma wê ya kevneşopî derxist û bi dîplomasiyeke jîr û bi gotareke Kurdistanî û modern, wêneyekî serdemî ji pirsa rewa ya neteweya xwe nîşanî cîhana derve da û xebata mafxwazane ya neteweya xwe bir ser seko û platformên dîplomasiya welatan û rêxistinên navdewletî. Hemû cehda Dr. Qasimlo ew bû ku pirsa neteweyî ya kurd di çarçoveya prensîbên aştîxwaz û dêmokratîk de çareser bike.

Dr. Qasimlo bi hûrbînî û dîplomasiyeke bihêz karî têgehên wekî mafê neteweyî, kurdayetî û xebat û berevaniya çekdarî hevseng bike û pîvanên xebat û têkoşîna Hizba Dêmokrat bixe nav prensîbên sereke yên wekî neteweyîbûn, dadperweriya civakî, azadiya siyasî û dêmokrasîxwaziyê.

Di demekê de ku desthilatdarên Îranê bersiva her cudahiyeke fikrî bi teror û tepeserkirinê didan, Dr. Qasimlo pêşniyara modeleke siyasî dikir ku tê de doza neteweyî girêdayî parastina rûmeta mirovî û dêmokrasiyeke kûr be.

Îro piştî nêzîkî çar dehsalan, ew hizra Qasimlo ku "demokrasiyê" wekî bingeha çareseriyê dizane, bûye mertalê berevaniyê ya civaka Kurdistanê li hemberî her cure bîr û ramaneke tundrew û yekdestxwaz.

Ev jî ew e ku mîrata Qasimlo ji çarçoveya rêxistinekê derdikeve û dibe hivya pêşerojê û rêberiya neteweyekê ji bo dijberiya desthilata stemkar û gihîştina bi civakeke azad û bextewar.

Satûsevda û peywendiyên welatên Ewropî bi taybetî welatê Otrîşê li gel Îranê û çav-girtina qanûnî û siyasî li hember terorîzma dewletê ya Komara Îslamî, bi taybetî terora Dr. Qasimlo, di salên piştî hinge de derfet da Komara Îslamî ku hêdî hêdî li wan welatan "dîplomasiya terorê" berfireh bike û destê xwe bigehîne paytextên gelek welatên Ewropî.

Îro piştî 37 salan dema em bi hûrî li peywendiya navbera wan kiryarên terorîstî û rewşa niha ya navçeyê û êrîşên rejîmê yên li ser hizbên Rojhilatê Kurdistanê, welatên Erebî yên navçeyê û Herêma Kurdistana Îraqê dinêrin, em dibînin ku di vê navberê de ew rejîma ku Dr. Qasimlo wekî rêberê partiyeke neteweyî û dêmokrasîxwaz li dijî wê sekinîbû, bûye mezintirîn gef li ser ewlehî û seqamgiriya cîhanê û Rojhilata Navîn.

37 sal piştî terora Viyanayê û berdewamiya Komara Îslamî di hinardekirina şoreşa îslamî û teror û şer-firotina bi welatên derdorê û neûewlekirina navçeyê de, di encamê de Îran rastî şerekî malwêranker kirine ku di niha de berdewambûna vê siyasetê û encamên rewşa şer, civaka Îranê di warê civakî, aborî û siyasî de aniye ser lîva kendalê herrifîneke temam ku reway-etiya wê rejîmê di tewawiyeta xwe de biriye bin pirsê.

Di niha de rejîm ji bo veşartin şikestên xwe yên derekî, navxweya Îranê kiriye qada tepeserî, kuştin û tirsandinê û di vê navberê de jî Kurdistana Îranê wekî cografyayeke sereke ya tepeseriya sîstematîk bêtir ketiye ber givaşa hêzên ewlehiyê yên rejîmê.

Li hember vê rewşa tije krîz a pêkhateya desthilat û civaka Îranê de ku rejîm di asta herî zêde a hovîtiyê û di heman demê de di asta herî zêde a lewaziya xwe de ye, tevgera neteweyî ya kurd hewceyî têgihiştineke kûr a li ser hêza navxweyî û aktoriya xwe ye.

Erka hêzên siyasî û kit bi kit û koma civaka Kurdistanê ye ku rêzên hevxebatî û berxwedana xwe xurtir bikin. Derbasbûna ji kêşeyên vê serdema nû û bersivdana gef û êrîşên rejîmê yên li ser Kurdistanê, hewcehiya vê hevxebatiyê bêtir diyar dike.

Niha ku îradeyeke neteweyî li Rojhilatê Kurdistanê heye, bêguman em ji hivya serkeftinê nêzîktir in. Hizba Dêmokrat her dem li ser wê baweriyê bûye ku serkeftina bi ser rejîma Komara Îslamî de, di girêwa yekrêzî û xebata berfireh a li gel neteweyên bindest û hêzên azdîxwaz ên Îranê de ye.

Îro, hêza girseyî ya Rojhilatê Kurdistanê wekî sermayeyeke berfireh û mezin a civakî û siyasî, ne tenê hêza dijberî û berevaniyê ye li hember desthilata navendî de, belku hêzek e ji bo avakirina pêşerojekî baş. Ev sermayeya bêdawî ku hêza guhertinê ye, berhema bi dehan sal xebata pêşmergane, siyasî û medenî ya civaka Kurdistanê ye ku bi xwîna şehîdan û xebat û têkoşîna Kurdistanîbûnê berhem hatiye.

**Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!**

37 sal berê desthilatdariya Komara Îslamî jêve bû ku hizra Qasimlo dê li gel cestê wî ji nav bibe, dîrokê selmand ku ew şaş bûne, çunkî nifşên piştî Dr. Qasimlo çar dehsalan e bi têgihiştinê ve ew wekî rêber û rêbaza fikrî ya xwe hilbijartine.

Ji bo vê, bilindragirtina bîranîna Şehîdkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên wî, wîstgeheke giring e ji bo nûkirina peymanê li gel wê rêbazê ku Qasimlo, rêber û afirînerê wê bûye. Ji vî aliyî ve, vegera li ser wê sermayeya fikrî ya Dr. Qasimlo, anku ji nû ve xwendina wan armancên bilind e ku Qasimlo di pêxema wan de şehîd bûye û hewceyî xwe-mandîkirin, fîdakarî û têkoşîna berdewam e.

Di 37 saliya terora Viyanayê de, em serê rêz û emegdariyê li hember canê paqij ê şehîd Dr. Qasimlo û hevalên wî û hemû wan şehîdên ku di rêya azadiya Kurdistanê de canê xwe gorî kirine titewînin, bi taybetî nûtirîn şehîdên sorxelat ên vê dawiyê yên Kurdistanê, û em peymana wefa û berdewamkirina xebata tije şanazî ya neteweya xwe li gel rihê paqij ê rêberên xwe yên şehîd nû dikin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**21ê Pûşpera 1405an (12/7/2026)**

# Daxuyaniya Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi Boneyê Qedexekirina Spaha Pasdaran ji aliyê Dewleta Brîtanyayê ve



Roja duşemê, 22'yê Pûşpera 1405'an a Rojî (13'yê Tîrmeha 2026'an a Zayînî), dewleta Brîtanyayê di gaveke berpirsiyarane û wêrek de, Spaha Pasdarên rêjîma Îslamî ya Îranê xiste nav lîsteya rêxistinên qedexekirî yên Brîtanyayê, biryarek ku dê komek encamên yasayî li pey xwe bîne û dawî li kiryar û tevgerên terorîstî yên endam û dawûdestkên Spaha Pasdaran li wî welatî bîne. Givaşxistin û terîkxistina mezintirîn rêkxistina dewletî ku piştewanê sereke ya terorîzmê ye li cîhanê, hem gaveke yasayî ya di cih de ye û hem jî hewcehiyeke dîrokî û exlaqî ye ji bo parastina ewlehiya cîhanî û çespandina dadperweriyê.

Pêvajoya bi terorîstnasandina Spaha Pasdaran ku serî de ji aliyê dewleta Amerîkayê û piştre dewletên Behreyn, Erebistan, Kanada û Swêdê ve hatibû ragihandin û niha dewleta Brîtanyayê jî li ser zêde bûye, tevî ku biryareke rast û di cih de ye û bi awayekî cidî terorîzma dewletî ya Komara Îslamî dixe bin givaşê, ji bo gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê û bi taybetî ji bo Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê komek wateyên girîng û peyamên hêvîbexş ên taybet dihewîne.

Bi terorîstnasandina rêxistina Spaha Pasdaran di roja 22'yê Pûşperê de û tam di wê demê de ku gelê kurd û têkoşerên Hizba Dêmokrat bîranîna 37 saliya terorkirina rêberê navdar ê kurd Dr. Qasimlo û hevalên wî dikin, hem wekî merhemekê ye li ser birîneke dîrokî û hem jî rûmetdanek e li ser erka dadperwerane ya civaka navdewletî.

Tepeserkariya 47 salî ya gelê kurd û terorkirina rêberên aştîxwaz mîna Dr. Qasimlû tam li ser maseya danûstandinê û piştre Dr. Şerefkendî û hevalên wî di dilê Ewropaya azad de, pir beriya desthilatdarên cîhana azad, naveroka wê rêjîmê û Spaha Pasdaran wekî cîbicîkarê planên navxweyî û navdewletî yên rêjîmê ji bo gelê me eşkere kiribû û hawara gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê ber bi civaka navdewletî ve ji bo birîna wî destî nêzîkî 5 dehsalan e hatiye bilindkirin.

Sêdaredanên sehrayî û komkujiya xelkê Kurdistanê, komkujiyên Qarnê, Qelatan, Sewzî û Serçinar û qirkirina bi dehan gundên din ên Kurdistanê, bombebarankirina dibistan û bingehên tenduristiyê û cihên akincîbûna malbatên têkoşerên kurd li Başûrê Kurdistanê û terorkirina zêdetirî 500 kadro, pêşmerge û endamên hêzên xebatkar ên kurd li Başûrê Kurdistanê ku beşa herî zêde endamên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ne, û herwisa terorkirina bi dehan kesayetiyên siyasî yên dijberên rêjîmê li welatên Ewropayê, tenê çend mînak in ji wan bi sedan kiryarên terorîstî yên Spaha Pasdaran ku her yek ji wan bi tenê dikare bibe belgeyeke tam û biryarder ji bo civaka navdewletî bi armanca selmandina terorîstbûna wê rêkxistina dewletî ya terorîstî û şêrpenşeyî.

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî!

Dewletên azad û pêşketî yên cîhanê!

Rêxistinên navdewletî yên parêzerên mafên mirovan!

Niha piştî derbasbûna 47 salan di ser temenê pîs û tije tawan û tevdaniyane yê Komara Îslamî û Spaha Terorîst a Pasdarên rêjîma Îslamî re ku hemû aliyên sereke yên hêz û biryardana Komara Îslamî di dest de ye, hewce ye ji bo hemûyan rohn û eşkere be ku ewlehî û asayîşa navdewletî bêyî dawîanîna li mezintirîn rêjîma siyasî ya piştgira terorê, wate Komara Îslamî ya Îranê, pêk nayê.

Êdî çetegeriyên deryayî yên Spaha Pasdaran li rêyên avî yên navdewletî mîna Tengava Hormozê ku bûye sedema rehîngirtina aboriya navdewletî û bandora rastewxwe li ser jiyana piraniya rûniştvanên cîhanê çêkiriye, divê cîhanê bîne ser wê qenaetê ku Komara Îslamî ya Îranê sereketirîn pabendbûna xwe ya navdewletî ku di peymannameya Neteweyên Yekbûyî de hatiye û Îranê îmze li ser kiriye, bi tevahî binpê kiriye.

Li ser vê esasiyê jî, civaka navdewletî û bi taybetî Encûmena Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî li ser mil e ku ji aliyekê ve piştgiriya gelên azadîxwazên Îranê û bi giştî hemû azadîxwazên cîhanê bike ji bo dawîanîna li wê desthilatdariyê, û ji aliyê din ve erka xwe ya sereke di vegerandina ewlehiya navdewletî de bi pêkanîna hevahengiyeke navdewletî dijî wê rêjîmê bi cih bîne.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê wekî qurbaniya sereke ya destê terorîzma Spaha Pasdaran ku heta niha û tevî corek ji agirbestê ligel Amerîka û Îsraîlê, herwisa berdewamiyê dide êrîşên mûşekî û dronî yên bo ser cihên rûniştina jin û zarokên têkoşerên me, tevî nîşandana piştgiriya xwe ji bo wê biryara dewleta Brîtanyayê ya ji bo kurtkirina destê spaha terorîste Pasdaran, bang li kom û civat û rêxistinên navdewletî yên alîgirên mafên mirovan dike ku hemû hewldanên xwe ji bo zêdetir givaşxistina ser rêjîmê û xistina bin pirsê ya rewabûna Komara Îslamî di pêxema vegerandina rûmeta mirovî bo gelên Îranê bixin ger. Hizba Dêmokrat di heman demê de amadeyiya xwe bo hevkarîkirina di xebatê de dijî wê rêjîma terorîst û kevneperest a sedsalên navîn radegihîne.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**23'yê Pûşpera 1405'an a Rojî, hemberî 14'yê Tîrmeha 2026'an a Zayînî**

# Peyama Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat bo Koça Dawî ya Lindsey Grahams




**Kak Mistefa Hîcrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi vê helkeftê peyameke sersaxiyê bo malbata navborî hinart.**
**Deqa peyamê bi vî awayî ye:**

**Ji bo: Ofîsa Birêz Senator Lindsey Graham û Binemala wî a rêzdar!**

Digel silav û rêzan,

Bi helkefta koça dawî ya Senator «Lindsey Graham»-, ez bi navê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve sersaxiya xwe ya kûr bo binemala wî a birêz radigehînim.

Nav û bîranîna Senator Graham ji ber pabendbûna hertimî bi xizmeta giştî, dilsoziya bo ewlehiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û hevalbendên wê, herwisa piştgiriya wî ya berdewam ji wan kesên ku li seranserê cîhanê bo azadî, dêmokrasî û rûmeta mirovî têkoşîn kirine, bi zindî dê bimîne.

Bo gelek ji hêzên Kurdistanê û hêzên dêmokratîxwaz ên Îranê, Senator Graham dengekî rêzlêgirtî bû ku têgihiştineke kûr ji zilm û tepeserkariya rejîmên dîktator hebû û bi nirx ve li xebatkarên azadî û dadperweriyê dinêrî. Kesayetiya tije prensîb û pabendbûna wî ya bêrawestan bi wan nirxan, rêz û hezkirina azadîxwazan bo navborî zêde kiribû.

Digel hevpariya xemê û sersaxiya me ji endamên binemalê, hevkar, dost û stafê dilsoz ê ofîsa Senator Graham û hemû ew kesên ku rûmeta xizmetkirinê di pêxema azadî û mafên mirovan de ligel wî hebûye, em hêvîdar in mîrata xizmetguzarî, wêrekî û pabendbûna wî bi nirxên bilind berdewam be û bi zindî bimîne.

**Digel rêza me**
**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Sikirtêrê Giştî Mistefa Hîcrî**

# Mistefa Hicrî: Di bin tu şert û mercan de em ji daxwazên xwe paşvekişînê nakin

Kak Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, di hevpeyvînekê de ligel kanala televîzyonî ya “Zagros 24”ê, siyaset û nêrîna Hizba Dêmokrat li ser pirsên siyasî yên Kurdistan û Îranê şirove kirin. Ew bi zelalî bersiva gelek pirsên têkildarî rewşa têkoşîna partiyên siyasî yên Kurdistanê, têkiliyên navbera wan, û derfet û metirsiyên li pêşberî tevgera Kurd li Îranê daye.




**Şehîdbûna Pêşmergeyan û Xebata Çekdarî**

Kak Mistefa Hicrî di bersiva wê pirsê de ku “Hûn çawa li şehîdbûna komeke pêşmerge û gerîlayan di bûyerên meha borî de dinêrin, û gelo ev tê wateya destpêkirina xebata çekdarî ya li dijî Komara Îslamî?”, got: “Plana teror, kuştin û êrîşkirina ser partiyên Kurdistana Îranê ji aliyê rejîmê ve tiştekî berdewam e. Çimkî ji bilî tepeserî û tundûtûjiyê ti tiştekî din ji destê Komara Îslamî nayê. Armanca wan ji vê tenê tirsandin, xof û paşvekişandina civak û tevgera siyasî ya Kurdistanê ye, ku bêguman ev hewldaneke berdewam a herdem şikestxwarî ye.

Ji aliyekî din ve, her çend dîroka Hizba Dêmokrat kevntir e û vedigere beriya desthilatdariya Komara Îslamî jî, lê di dema 47 salên desthilatdariya vê rejîmê de, di gelek qonaxên demkî de xebata çekdarî li dijî rejîmê kiriye û xebateke sivîl û medenî ya berfireh jî birêxistin kiriye. Lê belê sirûştî ye, heke Komara Îslamî ya Îranê li ser vê siyaseta xwe ya li hemberî hêz û tevgêra Kurd berdewam be, dibe ku tu rêyeke din ji bo bersivdayîna rejîmê nemîne û di dawiyê de mafê gelê Kurd e ku berevaniya rewa ji hebûn û rûmeta xwe bike.”

**Sedemên Tevlînebûna Şerê 40-Rojî**

Sikirtêrê Giştî yê Hizbê di bersiva wê pirsê de ku “Çima, di şerê 40-rojî de we hêzên xwe neşandin û eniyeke nû ya şer li dijî Komara Îslamî venekir?”, sedemê vê yekê vegerand nebûna hevsengiya hêzê û got: “Rast e, Komara Îslamî di wî şerî de derbên giran xwarin, lê me dît ku bi wan êrîşan neherifî. Mixabin desthilatdariya Komara Îslamî ewqas hêza wê heye ku li dijî hêzên Kurdistanî bixe dewrê. Li gorî wê tûreyî û kîna ku li hemberî Kurdan heye, heke hêzên pêşmerge vegeriyana, rejîmê dê tola hemû wan şikestin û ziyanên ku di êrîşên Îsraîl û Amerîkayê de xwaribûn, ji xe Kurdistanê hilanîba. Wekî çawa di xwepêşandanan de de xelkekî zêde kuştin, bêguman li Kurdistanê komkujî dê ji wê jî mezintir û girantir bûba.”

**Kak Mistefa Hicrî her wiha ev biryara hêzên Kurdî bi rast û di cih de zanî û got:**

“Partiyên Kurdî karekî pir rast kirin ku tevgereke wisa nekirin ku nîşan bidin ew mil bi mil û bi hevahengî ligel hêzên Amerîka û Îsraîlê êrîşî ser Komara Îslamî dikin. Çimkî her du welatan jî siyaset û armancên serbixwe û cuda ji hev li dijî Komara Îslamî hebûn. Ji ber vê yekê, bêguman vegerîna hêzên partiyên Kurdî, dê li dijî berjewendiyên gelê Kurd baya.”

**Birêz Hicrî di dawiyê de ev rastî jî bi bîr xist ku:**

“Kurdistan bi tenê nikare rejîmê birûxîne, her çend ku ji hemû beşên din zêdetir ji bo azadiya Kurdistanê û demokrasiyê li Îranê têkoşiyaye, qurbanî daye. Ji ber vê yekê, rast e ku ew jî mîna xelkê din li Îranê tevbigere; anku ne li pey wan bimîne û ne jî ewqas pêş bikeve ku qurbaniyeke pir mezin bide.”

**Siyaseta Welatên Rojava Beramberî Komara Îslamî**

Rêzdar Mistefa Hicrî di bersiva wê pirsê de ku “Gelo ev kêmasiya tevgera Kurd e ku pirsa Kurd di hawkişeyên navdewletî yên li dijî Komara Îslamî de nayê rojevê?”, rexne li siyaseta Amerîka û Ewropayê ya li hemberî Komara Îslamî girt û got:

“ Ji roja yekem a hatina ser desthilatê ya Komara Îslamî û heta 40 salan jî, siyaseta Amerîka, Ewropa û bi giştî siyaseta cîhanê piştgiriya rejîma Komara Îslamî ya Îranê dikir. Çimkî wan weha dizanî ku rejîm gav bi gav dê siyasetên xwe yên îdeolojîk biguhere û bibe hikûmeteke hevseng. Herdem siyaseta Amerîkayê ew bû ku kar bikin ji bo guhertina reftara Komara Îslamî, ne guhertina rejîma siyasî.

Sirûştî ye ku Îran welatekî dewlemend e û welatên bihêz ên cîhanê herdem xwestine bi rêya peywendiyên siyasî û bazirganî, qazanc û berjewendiyên xwe di wî welatî de biparêzin. Heta di wan deman de jî ku Komara Îslamî çalakiyên terorîstî li dijî têkoşerên Kurd û dijberên rejîmê li welatên Ewropayê encam didan, ew dîsa jî li ser vê siyaseta xwe berdewam bûn, bi wê hêviyê ku rojekê rejîm reftar û siyaseta xwe biguhere û ew bikaribin ligel rejîmeke serdemiyane, bazirganiya xwe bidomînin.

Diyar e niha wekî ku xuya dike, ew jî gihîştine wê qenaetê ku her çend derfet dane vê rejîmê, tu guhertin tê de çênabe. Loma em dibînin ku niha reftara wan li hemberî rejîmê guheriye û ez dûr nabînim ku ji niha û pê de pirsa Kurd û bi giştî opozisyona meydanî ya Îranê bêtir bibe rojeva hevkêşeyan.”

Pirseke din a di vê hevpeyvînê de têkildarî pêgeha Kurdan di nav dijberî rejîmê de bû. Kak Mistefa di bersiva wê pirsê de ku “Heke opozisyona Komara Îslamî li hemberî pirsa Kurd vekirîtir tevbigere, lê hîna jî federalîzm û otonomiyê qebûl neke, gelo Hizba Dêmokrat dê ji daxwaz û stratejiyên xwe paşvekişînê bike?”, got: “Di bin tu şert û mercan de em ji daxwazên xwe paşvekişînê nakin. Çimkî em bawer dikin ku daxwazên wekî daxwazên me rewa, nûjen û beşeke bingehîn in ji wê dêmokrasiya ku em hemû ji bo wê dixebitin. Lê belê, dibe ku di bin hin mercan de hinek nermbûn çêbibe. Di siyasetê de nabe em li ser bingeha ‘sifir yan sed’ mamêleyê bikin. Belku tiştê ku em bi dest dixin û di şiyana me de ye, em qebûl dikin û dikin bingeh û gava yekem ji bo berdewamkirina daxwaz û daxwaziyên xwe yên din. Çimkî daxwaza dêmokrasiyê û dabînkirina mafan, heta ku jiyan berdewam be û daxwaza pêşketinê hebe, qet bi dawî nabe.”

Kak Mistefa Hicrî di vê hevpeyvînê de li ser destpêşxeriya Hizbê ya di avakirina Navenda Hevkarî, Navenda Diyalog û Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê de di salên borî de, tekezî li ser hewcedariya yekitiya zêdetir a partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê kir. Wî yekgirtina gel û partiyan wekî sedem û pêdiviya pêşvebirina xebatê û serkeftina bi ser Komara Îslamî de pênase kir.

Birêz Hicrî di bersiva wê pirsê de ku “Erkên hevpeymaniya hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê û gef û metirsiyên li ser nemana vê hevpeymaniyê çi ne?”, got: “Armanc ji vê hevpeymaniyê bihêzkirina pêgeha Kurd e û ev yek jî bi rêxistineke çêtir û berfirehkirina hevpeymaniyê pêk tê.

Herwisa em ne tenê di serdema xebata li dijî rejîma Komara Îslamî de, belku piştî rûxandina rejîmê jî ji bo îdarekirina Kurdistanê û ji bo bihêzkirina pêgeha Kurd di hikûmeta pêşerojê ya Tehranê de, hewcedarê yekitiya nava mala Kurdî in.

Derbarê wê pirsê de ku gelo metirsiya hilweşînê li ser hevpeymaniyê heye an na, divê ez bêjim ku tu hevpeymanî ne herdemî ye. Hevpeymanî li ser bingeha hevsengiya hêzê, qazanc û berjewendiyan ava dibin û dibe ku rojekê ev hevpeymanî ji ber guherîna hevsengiya hêzê an guherîna berjewendiyan rastî guhertinan bibe. Lê belê ev nayê wê wateyê ku tu nikarî hevpeymaniyeke din ava bikî. Lê heta wê dema ku wekî Kurd berjewendiya me di hevpeymanî û karê hevpar de bin, divê em hewl ji bo wê bidin.”

**Proseya “Rasan” û Peymana Ewlehiyê ya Sêalî**

Sikirtêrê Giştî yê Hizbê derbarê Tevgera”Rasan” û di bersiva wê pirsê de ku “Destkeftiyên Rasanê çi bûn ku beriya 10 salan hatibû ragihandin û çima Hizba Dêmokrat ew da sekinandin û hêdî hêdî sist kir?”, got: “Rasanê tevî xesara canî ya ji bo hizbê, destkeftiyên pir mezin jî hebûn. Çimkî di rewşeke wisa de ku bêhêvîtî ketibû dilê xelkê, hêviyeke nû da xelk û civakê û nîşan da ku hêz, şiyan, xebat û xweragiriya Hizba Dêmokrat her li ser piyan e û hêza pêşmerge hîna jî dikare derbên giran li rejîmê bixe. Lê belê, ji ber zextên derve ji aliyê Bexda û Herêma Kurdistanê ku her du jî di bin zextên Komara Îslamî de bûn, ev tevger hêdî hêdî kêm bû. Bêguman ji bo me jî wekî Hizba Dêmokrat bername ew nebû ku em herwisa berdewam bikin.”


Kak Mistefa Hicrî derbarê bandora rêkeftina ewlehiyê ya navbera Tehran-Bexda-Hewlêrê de li ser çalakiyên partiyên Kurdî yên dijberî Komara Îslamî, got: “Gava ew li ser vê yekê li hev dikin ku em hêzên pêşmerge ji Herêma Kurdistanê ve neşînin navxweya Rojhilat, û di demekê de ku em li ser axa xwe nînin û baregehên fermî û eşkere yên partiyên me li welatekî din in, sirûştî ye ku zextên derve dê bandorê li ser me bikin.”

**Corê Federalîzma ku Tê Daxwazkirin**

Têkildarî dirûşma stratejîk a Hizbê ku “dabînkirina mafên neteweyî gelê Kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de ye” û di bersiva wê pirsê de ku “bingeh û corê vê federalîzmê çi ye ku Hizba Dêmokrat daxwaz dike?”, got: “Em di wê baweriyê de ne ku baştirîn corê federalîzmê, federalîzma cografî û neteweyî ye. Em dixwazin hemû netewe bi nasnameya xwe ve di desthilatê de beşdar bin û hemû alî para xwe di desthilat û birêvebirina welat de bistînin.

Ji bo herêmên kêşeliser jî madem baweriya me bi dêmokrasiyê heye, sirûştî ye ku piraniya dengê xelkê herêmê dê biryarê bide. Anku di wan bajarên ku her du neteweyên Kurd û Tirkên Azerî lê hene, encumena bajêr an encumena gund e ku wan deran bi rê ve dibe û desthilatdarî bi dengê azad ê xelkê tê yekalîkirin û dabeşkirin.”

# Gelo Qasimlo ligel daxwazên îro yên neteweya xwe dimeşiya?



N. Dr. Mecîd Heqî



Di gotûbêjeke dostane de, pirsek ji min hat kirin ku rengvedana yek ji girêkên siyasî yên herî girîng ên dîroka hemdem a Kurdistanê ye: «Doktor Qasimlo ku baweriya wî bi "demokrasî ji bo Îranê û otonomî ji bo Kurdistanê" hebû û xwe ji her îraniyekî îranîtir didît, gelo heke îro sax ba, ev dirûşmeyên îro yên kurdên Rojhilatê Kurdistanê mîna federalîzm, daxwaza mafê diyarkirina qederê (çaranûsê) û heta serxwebûnê ji bo wî dihatin qebûlkirin?»

Min jî bêyî dudilî û bi piştgirêdana bi şarezayiya xwe ya li ser fikra siyasî ya wî rêberî, weha bersiv da: Belê! Ji bo Doktor Qasimlo pirsa neteweyî ne pirseke "statîk" (îsta) û rawestiyayî bû, belkî pirseke siyasî ya zindî û di rewşa guhertin û geşepêdana berdewam de bû. Qasimlo rêberekî lêzan û dûrbîn bû, ew ne mirovekî weha bû ku di qalikekî dirûşmeya serdema xwe de bimîne, belkî ji bo paşrojê xwediyê bername û projeyên stratejîk ên mezintir bû.

Ji bo ku ez hevalê xwe qanî bikim, min çend nimûneyên dîrokî jê re anîn edet û di vê gotarê de ez dixwazim bi hûrgulî û bikaranîna teoriyên siyasî û pirsa geşepêdana neteweyî, vê rastiyê şîrove bikim.

Têza doktorayê ya Doktor Qasimlo belgeya yekem bû ku min ji hevalê xwe re anî, ku paşê di bin navê pirtûka dîrokî ya "Kurdistan û Kurd" de hat weşandin. Ev têz di salên 1960î de hatiye nivîsandin, serdemek ku cîhan di navenda Şerê Sar de bû û Doktor Qasimlo bixwe jî li Çekoslovakyayê dijî, ku welatekî sosyalîst ê girêdayî Peymana Varşovayê û di bin hêjmonya û sîbera tund a Yekîtiya Sovyetê de bû. Di wê serdemê de ku blokparêziyê rê nedida tu cûre guhertinan di struktura dewletan de, Qasimlo di wê pirtûkê de pêşniyara "Konfederasyona Rojhilata Navîn" dike, bi şêweyekî ku Federasyona Kurdistanê bibe parçeyek ji wê yekîtiya mezin, tiştekî mîna vê modela "Yekîtiya Ewropayê" ya îro.

Ev yek ji me re dibêje ku ji aliyê teoriya pêkhateya desthilatdariyê ve, Qasimlo her ji wê serdemê ve di sîbera "otonomiyê" de derbas bibû û di asta stratejîk de li ser modelên bilindtir ên mîna federalîzm û konfederasyonê difikirî. Di zanista siyasî de, otonomî modelekî navend-tever e ku tê de desthilatdariya sereke li cem navendê ye û parçeyek ji wê desthilatdariyê dispêre jêr, lê federalîzm û konfederasyon li ser bingeha parvekirina serweriyê (Shared Sovereignty) ava dibin.

Qasimlo çil sal beriya geşebûna van têgehan di navçeyê de, hewcedariya guhertina pêkhateya hêzê fêm kiribû. Piştî ku Doktor Qasimlo bû sekreterê giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistanê, di dema 18 salên sekreteriya xwe de, stratejiyeke piştgirêdan bi "kongre bi kongre nûjenbûnê" di nav hizbê de peyrew kir. Ji aliyê Teoriya Geşepêdana Siyasî (Political Development Theory) ve, partî û rêxistin heke şiyana xweguncandinê ligel şert û mercên serdemê de nebin, rûbirûyî dogmatîzm (çeqbestuyî) û mirina siyasî dibin. Qasimlo ev yek baş dizanibû.

Gava wî ya herî girîng di vê qonaxê de ew bû ku Hizba Demokrat û pirsa kurd ji hizba Tûde ya Îranê cuda kir û serxwebûna siyasî ya wê hizbê mîsoger kir. Ev ne tenê guhertineke rêxistinî bû, belkî ji aliyê teorîk ve bi wateya cudakirina pirsa kurd ji pirsa giştî ya Îranê bû. Wî îspat kir ku pirsa neteweyî ya Kurdistanê dosyeyeke taybet û serbexwe ye û nabê bibe paşkoya kêşeyên navxweyî yên opozisyona îranî yan navendê.
Her di dema vê nûjenbûnê de, wî di peywendiya paşroja Kurdistanê de pêşniyara modela "Sosyalîzma Demokratîk" kir. Gava em li pirtûkoka (namilkeya) "Kurtebasek li ser Sosyalîzma Demokratîk" dinêrin, ew pir bi ciwanî û hûrgulî şîrove dike ku armanca sereke ya vê kurtebasê û vê modelê, di bingeh de "Rojhilatê Kurdistanê" ye. Ev jî nîşaneya wê yekê bû ku projeyeke taybet û serbexwe ji bo avakirina civaka paşerojê ya Kurdistanê di mêjiyê wî de hebû.

Pirsa kurd di dema sed salên borî de guhertinên pir mezin bi xwe ve dîtine. Wê çaxê ku Doktor Qasimlo rêberiya Partiya Demokrat dikir, hîna pirsa neteweyî bi vê şêwaza îro nebibû pirseke girseyî (cemaverî) û giştî di nav hemû mal û kolanên Kurdistanê de. Wê demê û beriya Qasimlo jî, pirsa siyasî û mafê diyarkirina qederê (çaranûsê), bêtir pirseke peywendîdar bi elîta siyasî, serkirdeyên partiyan û kêmaniyeke piçûk a rewşenbîran di navxoya elîta civaka Kurdistanê de bû. Lê dînamîzma dîrokê ranewestiya.

Niha rewş bi tevahî guheriye. Pirsa kurd bi şêweyekî wekhev û paralel di hemû beşên Kurdistanê de geşe kiriye û bûye pirseke girseyî ya kûr. Civaka Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê hişyariya neteweyî ve gihştiye lûtkeyê. Nimûneya herî berçav a vê rastiyê, di Newroza Xakîpêşanê (sala 2725an a kurdî) de xwe nîşan da; gava civaka Kurdistanê bi şêwazekî bêhempa, yekgirtî û medenî hatin qadan û nîşan dan ku bi şêweyekî giştî xwaziyarê diyarkirina qedera xwe ne.
Doktor Qasimlo wek rêberekî jêhatî, her dem peyrewî ji stratejiya "realpolîtîk" (realîzma siyasî) dikir. Wî baş dizanî ku dirûşmeyên siyasî amûrên tevgera siyasî ne, ne ku wekî tekstên pîroz û neguherbar bin. Rastiyên siyasî, hevsengiya hêzê, jeopolîtîk û rewşa aborî, navçeyî û navneteweyî dibin sedem ku dirûşme û armancên siyasî ji bo çareserkirina pirsa kurd li gorî serdemê bên guhertin.

Di serdema Doktor Qasimlo de, jeopolîtîka navçeyê û cîhanê rê nedida dirûşmeyeke mezintir ji otonomiyê. Sîstema du-cemserî hişyar bû di parastina sînoran de û opozisyona îranî jî tu cûre daxwazeke neteweyî qebûl nedikir. Ji ber vê yekê dirûşmeya "Demokrasî ji bo Îranê" kite kilît bû ji bo vekirina deriyê diyalogê û danasîna dosyeya kurd di asta navneteweyî de.

Bêguman îro realîteyên jeopolîtîk guherîne. Pêgeha navneteweyî ya kurdan bihêztir bûye, dewleta navendî li Îranê rewayiya (şerîata) xwe ya navxweyî û navneteweyî ji dest daye, û berî her tiştî civaka Kurdistanê di qonaxa netewesaziyê de pêş ketiye. Di bin ronahiya van guhertinan de, guhertina dirûşmeyan ber bi federalîzm û serxwebûnê ve, ne tenê dûrkeftina ji rêbaza Qasimlo nîne, belkî dirêjkirina sirûştî ya fikra wî ya dînamîk e.

Di dawiya axaftina xwe ya ji bo hevalê xwe de, min tekezî li ser vê xalê kir û min got: Ez bawer dikim ku heke îro Doktor Qasimlo sax ba, ne tenê nedibû neyar an dijberê dirûşmeyên hemdem ên gelê me, belkî ji ber pêgeha wî ya akademîk, siyasî û dîplomatîk a bêhempa, dê bibûya yek ji danerên (teorîsyenên) sereke yên teoriya rizgarîxwaz a qonaxa netewesazî û netewebûna xelkê Kurdistanê.

Ew dê bibûya endezyarê misogerkirina mafê diyarkirina qedera gelê kurd di yasa û korbendên navneteweyî de. Qasimlo fêrî me kir ku siyaset zanista hînbûn û guhertinê ye di pêxema gihîştina bi rizgariya neteweyî de, û îro jî Rojhilatê Kurdistanê bi şêwazekî yekgirtî li ser heman rêbaza geşepêdandî gavan diavêje.

# Ji Nû Ve Pênasekirina Xebata Kurdî Di Serdema Guherînên Mezin Da



N. Dr. Mehmûd Ebas

**Beşa Sêyem**

**Çawa Têgihiştina Hêzê Di Cîhanê Da Guherî?**

Hêz di cîhana îro da êdî ne ew hêza berê ye. Di demên borî da, hêz bi piranî bi hejmara leşkeran, firehiya axê, mezinahiya çek û cebilxaneyê, û şiyana dewletê ya destgirtina rasterast li ser welatê xwe dihat pîvan.

Lê îro ev hevsengî guheriye. Çek êdî bi tena serê xwe pêgehê çênake, û artêş bi tena serê xwe giraniya dewletan û gelan diyar nake.

Hêmanên nû ketine nav dilê hêzê: aborî, zanist û amûrên nûjen, dane, perwerde, ragihandin, û şiyana bandorkirinê li ser hiş û biryara mirovan.

Tenê ger mirov li Amerîka û Çînê binêre, dê bibîne ku pevçûna wan tenê di nav artêş û gemiyên şer da nayê kurtkirin. Ev pevçûn li ser zanistên hûr, zîrekiya çêkirî, perçeyên hûr ên amûrên zanistî, zanîngeh, rêyên berhemanînê, û bandora pere û bazara cîhanê jî diçe.

Herwiha Îsraîl, tevî biçûkbûna axa xwe, hebûna xwe tenê bi hêza leşkerî ferz nekir, lê bi pêşketina xwe ya zanistî, bandora xwe li navendên biryardana Rojavayê, û şiyana veguherandina zanînê bo hêmanekî parastina neteweyî jî xwe ferz kir.

Tirkiye jî, ku xwe wek hêzeke herêmî nîşan dide, tenê bi artêşa xwe têr nekir. Wê li pîşesaziya parastinê, balafirên bêmirov, ragihandin, belavbûna aborî, û bikaranîna cihê xwe yê erdnîgarî û siyasî veberhênan kir.

Ev mînak hemû nîşan didin ku hêz êdî tenê hêzeke leşkerî nîne, lê bûye pergala gelek alîyan.

Ji ber vê yekê, her gelek ku di vê cîhana nû da li cihê xwe digere, nikare bi hişê duh li cîhana îro bihiztire.

Ev yek ji bo gelê Kurd zêdetir rast e, ji ber ku doza wî qet tenê dozeke leşkerî nebûye.

Ew doza hebûna neteweyî, mafê dîrokî, û pevçûna li ser ax, nasname û pêşerojê ye. Lê kêmasî ew e ku beşeke mezin ji hişê siyasî yê Kurdî hê jî hêzê bi şêweyê kevin dibîne: destgirtina li ser axê, hejmara şervanan, hevsengiyên ewlehiyê, an firehiya hebûna partî. Ev hemû girîng in, lê êdî bi tena serê xwe têrê nakin.

Ezmûna Kobanê, wek mînak, nîşan da ku berxwedana leşkerî dikare di demeke dîrokî ya dijwar da hebûna Kurd li cîhanê ferz bike, û lehengî dikare bo demekê nêrîna cîhanê biguherîne.

Lê piştî Kobanê jî xuya bû ku serkeftina leşkerî, ger nebe sazîyên qewî, aboriyeke xurt, perwerdeyeke pêşketî, û têkiliyên siyasî yên fireh, dikare hêdî hêdî were xwarin û lawazkirin.

Ev yek di ezmûna rêveberiya xweser li Rojavayê Kurdistanê da jî diyar bû. Wê di salên şer û aloziyê da xwe ferz kir, valahiyeke siyasî û ewlehiyê tijî kir, lê nekarî vê ezmûnê bi wateya dûrbinî veguherîne hêzeke tevahî.

Rêveberiyek ku ji avakirina jiyanê zêdetir bi ewlehiyê mijûl be, ku bingeha wê ya aborî lawaz bimîne, ku nikare gotareke siyasî ya neteweyî û zelal bicih bike, û bihêle tengasiya jiyanê mezin bibe, bi demê re dê li ber westandin û xwarinê bimîne. Ev e ya ku Rojavayê Kurdistanê îro rû bi rû ye.

Kêşe êdî tenê ne gefên Tirkiyê ne, ne guherîna helwesta Amerîkayê ye, ne jî hilkişîna desthilateke navendî ya Sûriyê bi rengê tundrew e.

Kêşe herwisa ew e ku ev ezmûn ji hundir ve bi qasî pêdivî nehatiye parastin. Hebûna Kurdî tê da nebûye navendeke siyasî, aborî û çandî ya qewî ku xwe li hember hemûyan ferz bike.

Ya herî metirsîdar ew e ku gelê Kurd, tevî hemû qurbaniyên xwe li Rojavayê Kurdistanê, heta niha li ser axa xwe bi awayekî neteweyî û zelal nehatiye bilindkirin. Erdnîgarî nebûye pênaseyeke neteweyî ya eşkere ku bingehê dozê biparêze.



Şêwazên gotinê fireh û nezelal man, û rêveberî zêdetir nêzî rewşeke xizmetî bû, ne projeyeke neteweyî ya tevahî ku yên din ji cihê gelê damezrîner ve himbêz bike.

Bi derbasbûna demê, Ereb û yên din zêdetir di nav beşên rêveberî û gotara giştî da cih girtin, lê zelaliya aliyê neteweyî yê Kurdî paşve çû; wekî ku Kurd careke din xwîna xwe didin, lê di bicihkirina mafê xwe yê siyasî li ser axa xwe da dudilî dimînin.

Li vir kêşeya rastîn ya têgihiştina hêzê derdikeve holê. Hêz ne tenê ew e ku yekîneyên şerker an rêveberiyeke herêmî hebin.

Hêz ew e ku tu bikaribî nasnameya xwe ya siyasî bicih bikî, kûrahiya xwe ya neteweyî biparêzî, aboriyekê ava bikî ku koçberiyê rawestîne, perwerdeyekê damezrînî ku nifşên nû yên zana û rêber biafirîne, ragihandinekê biafirînî ku bi cîhanê re biaxive, û toreke berjewendiyên navneteweyî çêkî ku destdanîna li te biha bike. Bêyî van, her destkeftiyeke çarçovî dikare were lawazkirin, û her hebûneke siyasî dikare bê piştguhxistin.

Belkî berawirdkirina vê rewşê bi Herêma Kurdistanê ya Iraqê aliyekî girîng ji vê kêşeyê eşkere bike. Herêm, tevî kêşeyên xwe yên kûr, dubendiyên naskirî, û metirsiyên derve, karî navekî siyasî û erdnîgarî yê ta astekê naskirî ferz bike, û astek ji sazî, têkiliyên navneteweyî, û aboriyeke herêmî ava bike ku ew ji rewşeke leşkerî ya tenê qewîtir kir. Lê li Rojavayê Kurdistanê, qurbanî pir mezin bûn, lê wergera wan ya siyasî û neteweyî ne di asta xwîna dayî da bû.

Ji ber vê yekê, pirsa ku divê tevgera Kurdî îro li hember xwe bike ne tenê ev e: em çawa li ber xwe bidin? Pirs divê ev be: em çawa hêzekê ava bikin ku berxwedana me bikare bidome? Em çawa nahêlin qurbaniyên me bibin tenê bîranîneke lehengî? Em çawa aliyê neteweyî yê Kurdî bi aborî, perwerde, zanistên nûjen û dîplomasiyê ve girêdin? Em çawa şiyanên Kurdî li Ewropa û Amerîkayê, hêza ciwanên nav welat, û ezmûna komkirî veguherînin hêmanên hêza dûrbinî, ne tenê hêzên belavbûyî? Cîhana nû tenê wê nabîne ku tu şer dikî; ew wê dibîne ku dizane çawa şerê xwe veguherîne pêgeheke siyasî, aborî û zanistî ya sebatdar.

Ev e kêşeya Kurdî ya îro: xebat hê jî heye, lê wateya hêzê ya ku divê ev xebat hilgire hê bi tevahî nehatiye temamkirin. Ji ber vê yekê, ji nû ve pênasekirina hêzê ne xweşiyeke hizrî ye, lê mercê mana neteweyî ye.

Dahatû ne ya gel e ku tenê bîranîna qurbaniyan heye; dahatû ya gel e ku dizane çawa vê bîranînê veguherîne sazî, van sazîyan veguherîne bandor, û vê bandorê veguherîne naskirin. Wekî din, Kurd dê careke din bibin hêzek li çarçoveyê, lê lawaziyek di wergera siyasî da.

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Em di tu şert û mercî de ji daxwazên xwe paşve gav navêjin.”**




**“Nizar Amêdî”:**

**“ Serokomarê Îraqê derheq êrîşa cinayetkarane a rejîma Komara Îslamî bo ser hizbên Rojhelatê Kurdistanê bertek nşan da û bi tundî şermezar kir.e.**



**“Donald Trump:**

**“Stratejiya me jinavbirina şiyana leşkerî û etomî ya rêjîma Îranê ye.**



**“Marco Rubio”:**

**“Îran dixwaze Tengava Hurmizê wekî karta fişarê bi kar bîne.”**

# Şer, bernameya etomî û pêşeroja Îranê, Çima siyasetên rêjîma Îranê kawilkar in?



N. Eskender Ceiferî



Di salên dawî de, siyasetên rêjîma Îranê careke din ev welat xistiye navenda yek ji metirsîdartirîn qeyranên Rojhilata Navîn. Gelek hikûmetên rojavayî û pisporên ewlehiyê di vê baweriyê de ne ku berdewamkirina bernameya etomî, pêşxistina mûşekên balîstîk û zêdekirina bandora leşkerî li herêmê, bûne sedema zêdebûna nearamiyê. Di encamê de, aloziya di navbera rêjîma Îranê û Amêrîka û Îsraîl de gihştiye qonaxekê ku metirsiya şerekî berfireh zêde kiriye.

Yek ji girîngtirîn mijarên nakokiyê, bernameya etomî ya rêjîma Îranê ye. Ajansa Navnetewî ya Wizeya Etomê gelek caran ragihandiye ku asta dewlemendkirina oranyomê li Îranê, ji asta ku ji bo hewcedariyên asayî yên santralên etomî hewce dike, pir zêdetir e. Ev mijar bûye sedem ku Amêrîka, Îsraîl û gelek welatên Ewropayê gumanê li armancên vê bernameyê bikin. Fikarên sereke yên van welatan ew e ku ev şiyan di pêşerojê de ji bo çêkirina çekên etomî were bikaranîn, mijarek ku rêjîma Îranê hertim ew red kiriye, lê gumanên navnetewî hîn jî berdewam dikin.

Ji nêrîna Îsraîlê, bidestxistina şiyana çêkirina çekên etomî ji aliyê rêjîma Îranê ve, wekî gefeke rasterast li ser ewlehiya netewî ya vî welatî tê hesibandin. Karbidestên Îsraîlî ev bi salan e radigihînin ku ewê rê nedin Îran bigihîje asta berhemanîna bomba etomê. Amêrîka jî gelek caran tekez kiriye ku rêgirtina li belavbûna çekên etomî yek ji pêngavên sereke yên siyaseta wê ya derve ye û ji ber vê yekê givaşên aborî, dîplomatîk û heya vebijarka leşkerî jî ji ser maseyê rannekiriye.

Mijareke din a girîng, Tengava Hormozê ye, yek ji girîngtirîn rêyên veguhastina neft û gaza cîhanê. Beşek mezin ji hinardekirina ênêrjiya cîhanê di vê rêya avî re derbas dibe. Her cûre gefek li ser azadiya keştîvaniyê li vê herêmê dikare aboriya cîhanê bi qeyranê re rûbirû bike. Ji ber vê yekê, Amêrîka û hevalbendên wê livînên leşkerî yên berfireh li Kendavê pêk tînin û ragihandine ku ewê rê nedin rêya gemiyên bazirganî were girtin.

Di salên borî de, alozî li derdora Tengava Hormozê gelek caran zêde bûne. Êrîşên li ser gemiyên bazirganî, desteserkirina neftkêşan û gefên dualî bûne sedem ku gelek welat vê herêmê wekî yek ji xalên herî metirsîdar ên cîhanê bibînin. Zêdebûna pevçûnan ne tenê ewlehiya herêmê, lê bazara ênêrjiya cîhanê jî xistiye bin bandora xwe. Welatên pîşesazî baş dizanin ku her cûre astengiyek di derbasbûna neftê de ji Tengava Hormozê dikare bihayê ênêrjiyê bi awayekî berçav zêde bike û aboriya cîhanê bi pirsgirêkên cidî re rûbirû bike.

Rexnegirên rêjîma Îranê di vê baweriyê de ne ku beşeke mezin ji çavkaniyên darayî yên vî welatî, li şûna ku di aborî, perwerde, tendurustî û debara jiyana xelkê werin mezaxtin, ji bo bernameyên leşkerî, hajekan û çalakiyên terorîstî li herêmê de hatine xerckirin. Ew dibêjin ev polîtîka bûne sedema cezayên berfireh, kêmkirina veberhênana biyanî, zêdebûna enflasyonê, daketina nirxê pereyên vî welatî û dijwartirbûna jiyana bi milyonan xelkê li vî welatî de.

Li hember vê yekê, Amêrîka û Îsraîl dibêjin zextên siyasî û aborî ji bo rêgirtina li berfirehbûna gefên ewlehiyê pêwîst in. Ji nêrîna wan, heke bernameya etomî û şiyana leşkerî ya rêjîma Îranê bê sînor berdewam bike, metirsiya pêşvaziya çekan li Rojhilata Navîn dê zêde bibe û welatên din ên herêmê jî dibe ku li pey çêkirina çekên etomî ve biçin. Ev pêvajo dikare aramiya herêmê ji berê zêdetir bixe bin metirsiyê.

Gelek çalakvan di vê baweriyê de ne ku berdewamkirina gefên rêjîma Îranê, nebûna bernameya etomî ya zelal û zêdebûna rûbirûbûnên leşkerî yên ji aliyê rêjîma Îranê ve, egera çêbûna qeyranên nû zêde dike.

Di dawiyê de, pêşeroja Îranê berî her tiştî bi biryarên siyasî ve girêdayî ye. Gelek xelk li Îranê dixwazin welatekî wan hebe ku li şûna pevçûnên berdewam ên bi cîhanê re, balê bikişîne ser pêşkeftina aborî, azadiyên sivîl, afirandina derfetên kar û baştirkirina rewşa jiyana mirovan.

Kêmkirina aloziyê bi civaka navnetewî re, hevkarî bi saziyên navnetewî re û pêşengîdayîna bi berjewendiyên xelkê re dikare bingeha vegera Îranê bo ser rêya aramiyê û pêşkeftinê amade bike.

Tişta ku îro ji her demê zêdetir girîng e, rêgirtin li berfirehbûna gefên rêjîma Îranê û dîtina hin çareseriyan e ku ewlehiya herêmê zêde dikin, bêyî ku mirovên asayî bibin qurbaniyên hevrikiyên siyasî û leşkerî yên rêjîma Îranê. Pêşerojeke ewleh tenê wê demê çêdibe ku biryarên stratêjîk li ser bingeha berjewendiyên xelkê, zelalbûn û berpirsiyariyê werin girtin, ne li ser bingeha gurkirina alozî û rûbirûbûna berdewam a bi cîhanê re.

# Hevpeyvîna vê carê ligel rêzdar Azad Kurdî Çalakê siyasî li ser mijara şer û êrîşên di navbera Amerîka û Îranê de hatiye encam dan.





**Hevpeyvîn: Azad Kurdî**
**Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzade**

**Azad Kurdî: "Stratêjiya Amerîkayê heta niha jî ev yek e ku bi şereke demkurt bikare siyaset û liv û tevgerên rêjîmê biguherîne, lê Amerîka ligel rêjîmeke îdeolojîk û daxistî berbirû ye û hêşta jî bi awayê pêwîst nekarîne rêjîmê nas bikin ."**

**1.Eva ku îro di navbera Amerîka û Komara Îslamî de diqewime, hîn jî di çarçoveya şerê sînordar de ye, yan ketiye qonaxekê ku armanca sereke ya wê guhertina hevsengiya hêzê li herêmê û heta guhertina paşeroja Komara Îslamî ye?**

Ez bawer im ku şerê sînordar bersivder nebû ligel armancên ku Amerîka dixwest bidestve bîne. Ji ber ku kuştina demê bo rêjîmê girîng bû, ev yek jî ne bi dilê rêveberiya Trump bû .Stratêjiya Amerîkayê heta niha jî ev yek e ku bi şereke demkurt bikare siyaset û liv û tevgerên rêjîmê biguherîne, lê Amerîka ligel rêjîmeke îdeolojîk û daxistî berbirû ye û hêşta jî bi awayê pêwîst nekarîne rêjîmê nas bikin. Di rêveberiya Trump de Cîhgirê Serok Komar li dijî şerê demdirêj e, lewma derfet û meyadan jê re dan ku bikeve dan û standinan bi rêjîmê re. Lihevtêgihîştina demkî ya ku Cîhgirê Serok Komar ligel rêjîma Îranê wajo kiribû, li Amerîkayê kete ber rexneyên tund ên siyasetvan û senatorên Amerîkî û zêde di berjewendiya rêjîmê de didîtin heta Amerîka. Lê me dît ku ev lihevtêgihîştin heman rojên yekem ji aliyê rêjîma Îranê ve hate binpêkirin. Weke tê xuya kirin, Amerîka niha bi destpêkirina pêla sêyem a hêrişên van 2 hefiyên borî û ji nû ve destpêkirina dorpêçên li ser benderên Îranê, rêjîmê neçar bike bihê ser maseya got û bêjan, ku ew jî ne hêsan e. Rêjîm dixwaze şer dirêj bibe û demdirêjkirina şerê sînordar bi qazancê xwe dibîne, lê bê guman dê rêjîmê ber bi nemanê bibe. Heta hevpeymanên Amerîka ji ber girtina Tengava Hormuz nekevin nav şer bona hevkarî ligel Amerîka li dijî rêjîmê, nayê çaverêkirin ku armanca hêriş û pevçûnan ji holê rakirina rêjîmê ye weke vê rewşa ku li Lîbyayê pêk hat.

**2.Li gorî hewl û helwestên hemû aliyan heta niha, kîjan sênariyo zêdetir ihtîmal heye: berdewamkirina şerekî sînordar û kontrolkirî, firehbûna wê bo şerekî herêmî, an vegera careke din bo dîplomasî û gotûbêjê?**

Take çeka girîng ku di destê rêjîmê de maye û dikare pê bilîze di qada dîplomasiyê de, Tengava Hormuz e. Rêjîm bi çi awayekê naxwaze vê kartê ji dest bide, Amerîka jî berevajî vê yekê difikire û naxwaze îradeya rêjîmê li ser Tengava Hormuz zal bibe. Lewma ev du sedî sed li dijî hev in. Ev rewş dikare heta aseteke zêde şer û qada şer berfirehtir bike. Me dît ku di vê heftiyê de 7 welatên herêmê careke din ketin ber hêrişên teroîstî yên Sipaha Pasdaran a Rêjîma Îranê. Bi nerîna min çareseriya dîplomatîk bi rêjîma Îranê re bê feyde û mifah e. Di şerê 40 rojî de Amerîka qet li jêrxanên aborî, pirs, binkeyên elektirîk û avê neda, lê vê carê bi xurtî dide ber bombeyan û dihiloşîne. Ev yek amajeyeke berçav e ku Amerîka naxwaze êdî demê ligel rêjîma Îranê bikuje. berdewamkirina bombebarankirina binkeyên rêjîmê ji aliyê Amerîka ve û dorpêçên ser benderên Îranê, rêjîmê hartir dike û egera berfirehbûna şer û hêrişan zêdetir e, heta dîplomasî û got û bêjan. Ji ber ku ev îrade ji aliyê rêjîmê ve, ger na şer pêk nedihat.

**3.Di stratejiya niha de, Îsraîl heta çi radeyê aktorê sereke û biryarder e, û heta çi radeyê stratejiya Amerîkayê berçav digire? armanc tenê kêmkirina metirsiyên ewlehiyê ye, an jî guhertina tevahiya balans û nexşeya jeopolîtîk a Rojhilata Navîn?**

Îsraîl hevpaymanê sereke û mezin ê Amerîkayê ye li herêmê. Lê di vê qonaxê de ez bawer im ku Amerîka dixwaze Îsraîl beşdarî şer û hêrişan nebe, heta bikare hindek welatên herêmê û cîhanê bikişîne di nav şer de. Kêmkirina metirsiyan li ser ewlehiya Îsraîl ne armanc e, ji nav birina metirsî û xeteran armanca serke ye. Me dît Îsraîlê çi anî ser Hemas û Hizbulahê piştî 7ê Oktoberê. Herwiha kom û grupên din ser bi Îranê jî ketin ber hêrişan û nexşe bo lawazkirin û tunekirina wan jî hatiye darêtin.

**Rojhilata Navîn a sala borî êdî bi dawî hat. Guhertinên gelek mezin di meh û salên pêş de dê pêk bihên. Bi baweriya min neman û rûxandina rêjîma Îranê dikare heta 90 ji sedî Rojhilata Navîn hêmin û ewle bike.**

**4.Erîşên li dijî bingehên leşkerî, navendên fermandariyê, torên lojîstîkî û piran, çiqas dikarin şiyana Sepaha Pasdaran ji bo birêvebirina şerekî dirêjdemê lawaz bikin? Ya ev tenê taktîkek leşkerî ye, an beşek ji stratejiyek firehtir e ku armanca wê lawazkirina rejîmê yê?**

gurz û derbeyên ku rêjîmê di şerê 12 rojî bi Îsraîlê re xwarî ligel şerê bihara îsal ligel Amerîka û Îsraîlê xesarên gelek mezin in. Bi milyaran dolar xesar û ziyan gihîştiye rêjîmê. Renge 10 heta 20 salan nekarin xesaran ji nû ve ava bikin. Lê ger careke din destên rêjîmê bigîje pareyên zevtkirî ji aliyê Amerîkayê, dê bernameyên Etomî, çêkirina mûşek û dronan, herwiha hevkariya aborî û lojîstîkî ligel kom û grupên ser bi rêjîmê, dom bike. Amerîka bi vê yekê hesiya ye û êdî dixwaze heta pereyên rêjîmê jî kontrol bike.

**Bi baweriya min Amerîka û Îsraîl bona taktîkên biçûk neketine di nav vî şerî de, plan û nexşeya vî şerî tenê lawazkirina rêjîmê nîne, ji vê yekê mezintir e. Ger senariyoyên navxweyî alîkar bin, bi taybet kesayetî û rêxistinên azadîxwaz û demokrat, bo Amerîka jî hêsan dibe ku bikare rêjîmê ji kar bixe.**

**5.Di demekê de ku gelek welatên herêmê xwe ji firehbûna şerê nîgeran nîşan didin, lê di pratîkê de gavên bandordar nahavêtine, ev bêdengî çawa tê şîrovekirin? Ev nîşana sînordariya hêz û şiyanê ye, an jî bi awayekî nerasterast razîbûnek bo lawazbûna hêdî-hêdî ya Komara Îslamî?**

bawer im beşek li welatên herêmê dema 30 salan dibe ku ketine nav projeyeke berfireh a pêşketina aborî û xizmetguzariyên civakî bo gelên xwe û pêşvebirina civakên xwe di hemû waran de, kêmtir bala xwe dabûn li ser bernameyên xwe teyarkirina bi çekan. Van welatên Xelîcê karîna şer û rûbirûbûna ligel rêjîmê nebû. Ji aliyeke din, lihevtêgihîştin bi rêjîma Îranê re hindek ev welat nîgeran kirin, lê çend roj zêdetir nekişand. Ev nîgeranî ji stiratêjiyên Amerîkayê hindek di raya giştî ya welatên Xelîcê de hebû.

**Lê hemû dixwazin ku guhertin di pêkhateya rêjîmê de çê bibe, ji ber ku bo van derket ku rêjîma Îranê metirsiya herî mezin e li ser asayîş û ewlehiya wan. Hindek welat jî weke Pakistan û Turkiye naxwazin guhertin di pêkhateya rêjîmê de pêk bihê, da ku peşkên van guhertinan negihîje nav wan welatan.**

**Gelek spas bo rêzdar Azad Kurdî.**

# Dr. Qasimlo rêberek bo hemû nifşan



N. Sîna Qasimî



**Pêşekî**

Mirin dawiya jiyana mirovan e, lê dawiya hizr û ramanan nîne. Ramanên ku li ser bingeha azadî, dadperwerî û kerameta mirovî hatibine avakirin, ne bi derbasbûna demê tên bîrkirin, û ne jî bi jinavbirina fîzîkî xwediyên wan ramanan tên jinavbirin.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo ji wan mirovan bû ku hewl da siyasetê ji meydana tundûtîjî veguhirîne bi nîqaş û dêmokrasiyê.

Ji ber vê yekê, piştî derbasbûna dehan salan bi ser şehîdkirina wî re, navê wî hîn jî di bîra dîrokî ya Kurdistanê de zindî ye, û ramanên wî mijara nîqaş, lêkolîn û îlhamê ne ji bo nifşên nû.

**Qasimlo nûneratiya çi ramanekê dikir?**

Dr. Qasimlo nûneratiya ramanekê dikir ku tê de azadî, dêmokrasî, dadperwerî û rêzgirtina mafên neteweyan bi hevre vate peyda dikir. Ew li ser vê bawerê bû ku çareseriya pirsgirêkên gelê Kurd tenê bi rêya naskirina mafên neteweyî, avakirina dêmokrasiyê û serweriya yasayî mimkin e, û bêyî azadiya hemû welatiyan, ti neteweyek nikare bigehe mafê xwe yên rewa.

Qasimlo şûna tundûtûjiyê, diyalog û çareseriyên siyasî tercîh dida, û hertim li ser vê bawerê bû ku divê pirskirêkên siyasî bi rêya danûstandin û têgihîştinê bên çareserkirin. Wî herwisa tekezî li ser mafên mirovan, dadperweriya civakî û rêzgirtina ji bo cudatiya netewî û çandî, û civatek dadperwer dikir ku tê de hemî netewe û welatî mafên wekhev hebin.

Ev nêrîna dêmokratîk û modêrn ramanên Qasimlo veguherandine mîratek mayînde; mîratek ku, tevî derbasbûna nêzî çar dehikan ji şehîdkirina wî, hîn jî di nav gelê Kurd û lêkolînerên dîroka hevçerix de tê hesibandin û ji nû ve tê şîrovekirin.

**Çima nifşên nû hêj Qasimlo bi bîr tînin?**

Nifşa nû ya Kurdan Dr. Qasimlo ne tenê ji ber rola wî ya dîrokî di rêberiya tevgera Kurdistanê de bi bîr tînin, belkî ji ber awayê pênasekirin û meşandina siyasetê bi bîr tînin. Ew kesayetek bû ku zanayî, lêhatî, dîplomasî û rêbertî bi hevre dikire yek û hewl dida wêneyek cûda ya rêberekî siyasî pêşkêş bike.

Zindîmana navê Qasimlo ji ber wê yekê ye ku jiyan û çarenivîsa wî bûye beşek ji bîra dîrokî ya Kurdan. Şehîdkirina wî di dema danûstandinan de navê wî kir sembola nirxa azadî û hewildana çareserkirina pirskirêkan bi awayekî siyasî, nav û yada wî ji bo nifşên pêşerojê hertimî maye. Îro, gelek ciwan, bi lêkolîna berhem, axaftin û jiyana wî ya siyasî, hewl didin ku ezmûnên berê çêtir fam bikin û wan ji bo fêmkirina pêşketinên îroyîn bikar bînin. Ji vê nêrînê ve, bîranîna Qasimlo ne tenê rêzgirtinek ji bo kesayetiyek dîrokî ye, belkî vegotinek ji nû ve ya beşek ji dîroka Kurdistanê û ezmûnên wê yên siyasî ye.

**Bandora Qasimlo li ser tevgera siyasî ya îro**

Her çiqas Dr. Qasimlo bi dehan sal e ku ji aliyê terorîstên rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve hatiye şehîdkirin, bandora wî hîn jî di hin beşên gotûbêja siyasî ya li Kurdistanê de tê dîtin. Gelek ji têgehên ku wî tekez li ser kirin, di nav de beşdariya siyasî, pirsa jinan, parastina mafê neteweyî, têkiliya bi civaka navneteweyî re û hewldana ji bo çareseriyên siyasî, hîn jî cihê xwe di wêje û daxwazên hin tevgerên siyasî yên Kurd de cih girtiye.

Bandora Qasimlo ne tenê bi serdemeke dîrokî ve sînordar e, wî nîşan da ku têkoşîna siyasî dikare di heman demê de li ser prensîpan, diyalogê û dîplomasiyê bê avakirin. Ji ber vê sedemê, gelek çalakvan û lêkolîner raman û ezmûna wî ya siyasî wekî beşek ji sermayeya rewşenbîrî ya tevgera Kurd di rûbirûbûna dijwarîyên îroyîn de dibînin.

Ji vê dîtingehê ve, Qasimlo ne tenê kesayetiyek dîrokî ye, mîrata wî ya rewşenbîrî di nîqaş û nêzîkatiyên têkildarî pêşeroja siyasî ya Kurdistanê û mafên gelê Kurd de berdewam tê nirxandin û ji nû ve tê şîrovekirin.

**Nifşa Jîna û Ji nû ve xwendina ramanên Qasimlo**

Tevgera "Jin, Jiyan, Azadî", ku li Kurdistanê dest pê kir, di demek kurt de bû yek ji girîngtirîn serhildanên civakî û siyasî yên salên dawî. Di vê tevgerê de, gelê Kurd, bi gotina dirûşmên wekî "Qasimlo, Qasimlo, rêya te berdewam e", careke din navê Dr. Qasimlo anî qada têkoşînê. Ev dirûşme ne tenê bîranînek dîrokî bû, belkî nîşanek girêdana nifşê nû bi îdealên ku Qasimlo ji bo wan şer kir.

Tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" wisa kir ku nifşa nû carek din raman û ezmûnên kesayetên bi bandor ên dîrokê, di nav de Dr. Qasimlo, zîndî bike. Hawara dirûşma "Qasimlo Qasimlo, rêya te berdewam e" ji aliyê keç û xortên welat tenê dirûşmek bona germkirina xwenîşandanan nebû, ev bi vê vateyê bû ku wan ramanên Dr. Qasimlo nas kiribûn û hewldan ramanên Qasimlo bikin hevêna gihîştin bi azadî, kerameta mirovî, beşdariya siyasî û parastina mafên neteweyan û pirsa jinan. Ev ew nirx bûn ku bo her takek Kurd û xwenîşanderan û çalakvanan girîng bûn û xwe têde didîtin.

Dubarekirina navê Qasimlo li ser şeqaman nîşan da ku mîrata Qasimlo hîn jî di bîra Kurdan de zindî ye û dikare nifşên ku ji bo azadî û mafên xwe yên neteweyî û mirovî têdikoşin îlham bike.

**Gelo Qasimlo tenê ber Kurdan dikeve?**

Her çend Dr. Qasimlo yek ji pêşengên siyasî yên gelê Kurd e, raman û mîrata wî tenê bi civaka Kurdan ve sînordar nabe. Di axaftin û çalakiyên xwe yên siyasî de, wî her gav dêmokrasî, mafên mirovan, dadperwerî û bihevrejiyan di navbera neteweyan de parastiye, nirxên ku ji sînorên netewî û erdnîgarî derbas dibin.

Qasimlo li ser vê bawerê bû ku bidestxistina mafên gelê Kurd bi avakirina dêmokrasî û azadiyê ji bo hemû Îraniyan ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê, gelek kes wî ne tenê wekî rêberê tevgereke neteweyî, belkî wekî siyasetmedarekî ku hewla wekhevî û beşdarbûn tev netewan di asta herî ser a deselatdariyê û rêzgirtina hevbeş dida.

Lewra nav û yadê Qasimlo ne tenê di bîra dîrokî ya Kurdan de îro zindî ye, belkî di nav gelek lêkolîn, çalakvanên sivîl û kesên ku bi dîroka hevçerix re eleqedar in de wekî sembola diyalog, azadî û têkoşîna ji bo kerameta mirovan tê zanîn.

**Encam:**

Kesayetiyên mezin ne bi salên jiyana xwe, belkî bi raman, ked û ev bandorên ku li ser dîrok cî dihêlin tên naskirin. Dr. Qasimlo jî yek ji wan kesayetiyan e ku navê wî ji serdemeke dîrokî û Partiyeke siyasî derbas bûye. Wî mîratek ji hizr û raman, berpirsiyarî û hêvî ji bo pêşerojê li pey xwe hişt, mîratek ku hîn jî bang li nifşên nû dike ku ji bo azadî û dadperweriyê bifikirin, şer bikin û têbikoşin.

# Civaka Îranê di Siya Şer de: Siyaseta Lawazkirinê û Derûniyeke Westiyayî



N. Sefiye Xalidî




Di demekê de ku nûçeyên derbarê aloziyên leşkerî, agirbestên lawaz û îhtîmala ji nû ve destpêkirina şer serkêşiya rojevê dikin, ew kesên sivîl in ku ji her kesî zêdetir barê derûnî yê vê krîzê hildigirin. Jiyana di nava herikîneke berdewam a nûçeyên têkildarî êrîş, gef an jî metirsiya berfirehbûna şer de, bandoreke gelek giran li ser rewşa derûnî ya civakê dike.
Şer ne tenê avahî û binesaziyê wêran dike, belkî hiş û derûniya mirovan jî dike armanc. Gava welatî her roj bi fikarên derbarê paşerojê, ewlehiya malbata xwe, rewşa aborî û çarenivîsa welatê xwe de dijîn, fikar û bêhêvîtî dibin beşek ji jiyana rojane.

Li Îranê jî, berdewamiya aloziyên leşkerî û rewşa nediyariyê bandoreke kûr li ser tenduristiya derûnî ya civakê kiriye. Malbat ji bo paşeroja zarokên xwe bi fikar in, karsazî rastî bêîstiqrariya aborî tên û gelek ciwan jî derbarê tiştên ku li benda wan in de, hest bi tevliheviyê dikin. Ev rewş hêj girantir dibe dema ku raporên nakok ên derbarê agirbestê an jî destpêkirina dubare ya şer de, hesta ewlehiyê ji mirovan distînin. Herwiha, raporên dawî nîşan didin ku di nava van şert û mercên şer de, di nav gelek welatiyên Îranî de zêdebûna fikaran, zextên aborî û hesta nediyariyê heye.

Di rewşeke wiha de, her civakek bi awayekî xwezayî hêvî dike ku biryarderên siyasî, ligel parastina berjewendî û ewlehiya neteweyî, encamên mirovî û derûnî yên biryarên xwe jî li ber çavan bigirin. Kêmkirina aloziyan, xurtkirina dîplomasiyê, dabînkirina pêwendiyeke zelal û pêşkêşkirina xizmetguzariyên piştgiriya tenduristiya derûnî dikarin alîkariya sivikkirina hinek ji nîgeraniyên gel bikin. Berevajî vê yekê, rewşeke nezelaliyê ya berdewam û zêdebûna aloziyan (bêyî ku ferq bike kîjan alî berpirsiyar e) dê zexteke zêdetir bixe ser jiyana rojane ya mirovan.

Di zanista siyasetê de, ne tenê hêza leşkerî an destkeftiyên dîplomatîk in ku çarenivîsa neteweyekê diyar dikin; "moralê civakî" û "sermayeya civakî" jî wekî pêkhateyên sereke yên hêza neteweyî têne hesibandin. Îro, di nava aloziyên leşkerî û gefa nû ya şer de, dibe ku krîza herî mezin a Îranê ne li qada şer, lê di hişê bi milyonan welatiyên ku di navbera hêvî û bêhêviyê de asê mane, de be.

Di salên dawî de, civaka Îranê rastî rêze-qeyranan hatiye, ji zextên aborî û dorpêçan bigire heta xwepêşandan, bêîstiqrariya siyasî û niha jî gefên leşkerî. Di zanista siyasetê de, ev rewş dikare wekî cureyekî "westiyana siyasî û civakî" were pênasekirin, rewşeke ku tê de welatî, piştî ku gelek caran li ber qeyranan sekinîne, hêdî hêdî hîs dikin ku êdî şiyan an derfeta wan a bandorkirina li ser pêvajoya bûyeran nemaye.

Ji ber vê yekê, berteka gelek kesan îro ji ya salên borî cuda ye. Herçend berê nûçeyeke derbarê êrîşek an agirbestekê de pêleke kelecan an hêviyê çêdikir jî, niha beşeke girîng a civakê tenê temaşe dike, ne ji ber bêxemsaziyê, lê ji ber westandinê. Ev westandineke ku ji çerxeke dubarebûyî derketiye holê: aloziyên dubare, hêviya guhertinê, kêmbûna krîzê û piştre jî vegera heman rewşa nediyar. Ji nêrîna psîkolojiya siyasî ve, ev rewş dikare bibe sedema cureyekî "normalîzekirina qeyranê". Gava ku kes ji bo demeke dirêj rastî gef û bêewlehiyê tên, ew hêdî hêdî – ji bo parastina hevsengiya xwe ya derûnî – li hember nûçeyên têkildarî qeyranê, bertekeke hestyarî ya kêmkirî nîşan didin. Ev kêmbûna bertekê nayê wê wateyê ku fikar tune ye; belkî, ev yek pir caran nîşana stresa kombûyî û westandina derûnî ye.

Ji nêrîna zanista siyasî ve, nezelaliya berdewam dikare encamên demdirêj bi xwe re bîne; di nav wan de kêmbûna baweriya giştî, lawazbûna sermayeya civakî, kêmbûna beşdariya sivîl û zêdebûna hesta bêhêziya siyasî hene. Gava welatî bawer dikin ku biryarên girîng serbixwe ji daxwaz û berjewendiyên wan têne girtin, valahiya di navbera civak û pêkhateya desthilatdariyê de berfireh dibe û hesta girêdan û tevlêbûnê tê lawazkirin.

Rewşa niha ya Îranê dikare wekî rewşeke "li bendemana westîner" were pênasekirin; rewşek ku tê de ne pevçûn gihîştiye çareseriyeke zelal û ne jî aştiyeke mayinde hatiye sazkirin. Ev rewşa ne diyar civak xistiye nava rewşeke bêbaweriya kronîk û barê sereke yê vê yekê jî dikeve ser milê welatiyan.

Salên dirêj ên qeyranên aborî, siyasî û ewlehiyê bûne sedem ku beşek ji civakê tûşî cureyekî westandina siyasî bibe. Di vê rewşê de, gelek kes ne bi hêviyeke mezin li pêşhatên gengaz dinêrin û ne jî bertekên hestyarî yên berê nîşan didin; berevajî vê, ew bi piranî bûne temaşevanên bi fikar ku bûyeran dişopînin lê derbarê îhtîmala guhertineke bilez de gumanbar dimînin.

Di zanista siyasetê de, lawazbûna baweriya giştî û zêdebûna hesta bêhêziyê di nava welatiyan de, encamên girîng ên krîzeke dirêj-xayend in. Çiqas ev heyama nediyariyê dirêjtir bidome, ziyanên ku digihîjin sermayeya civakî, hêviya paşerojê û hesta ewlehiyê jî ewqas mezintir dibin. Ji vê perspektîfê ve, kêşeya herî krîtîk a Îranê ya îro ne tenê birêvebirina krîzeke leşkerî ye, belkî pêşîlêgirtina berfirehbûna wê valahiya di navbera civak, baweriya giştî û saziyên biryardanê de ye.

Di dawiyê de, çi armancên wê yên leşkerî an encamên wê çi bin jî, her şerek bi rastî tenê gava ku mirov careke din hesta ewlehî, aramî û hêviyê bi dest bixin, bi dawî dibe. Bêyî vegerandina baweriya gel û başbûna rewşa derûnî ya civakê, heta rawestandina şerê leşkerî jî nayê wê wateyê ku krîz bi dawî bûye. Dibe ku pirsa herî girîng a li pêşiya Îranê ya îro ne ew be ku şer dê kengî bi dawî bibe, belkî ew e ku çawa dikare hêvî û hesta ewlehiyê ji bo civakeke ku bi salan di bin siya krîzê de jiyaye, were vegerandin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Bikaranîna fisfora sipî li êrîşên dironiye Îranê bo ser Partiya Azadî a Kurdistanê

Li êrîşeke dironî a rejîma Îranê de bo ser yek ji binkên Partiya Azadiya Kurdistanê, madeya fisfora sipî têkel bi teqemenî bikar hatiye.

Partiya Azadiya Kurdistanê ragehand, li gorî pişkinîna bo rewşa 9 pêşmergên birîndar ên êrîşa wê dawiyê a rêjîma Îranê, û ew agirên berfireh li jîngeh û cihê rûdanê keftiye, derkeftiye ku çeka bikarhatî fisfora sipî tê de bûye.

Partiya Azadiya Kurdistanê ev êrîş wek tawanek şer û binpêkirina aşkera a yasaya navdewletî a mirovî li dema şer de tê hisab, çimkî bikaranîna çeka wisa ku mirov û jîngehê dişewitîne, berewajiyê hemû binemayên mirovî ne.

Hûner Ehmed belgefîlimsaz û rojnamenivîsê Kurd, bi belavkirina wêneya du kes ji pêşmergên birîndar yên vê êrîşê, nivîsiye, min serdana wan pêşmergan kir ku li gorî gotina Partiya Azadiya Kurdistanê, li êrîşek dironî de bûne amanc ku fisfora sipî di nava madên teqîna wan dironan de bûye.

Partiya Azadiya Kurdistanê daxwaz ji netewên yekgirtî û xaça sor û hikumeta Îraq û Herêma Kurdistanê kir ku bêdeng nebin û pêngavên yasayî bo sizadana Îranê û parastina ewlehiya deverê bigre ber, çimkî bêdengî derheq wan çekên qedexekirî, rê bo tawanên zêdetir xweş dike.




## Kuştin û birîndarbûna du Kesan bi teqeya rastewxwe a hêzên rejîmê li Sewllawa

Li dirêjeya binpêkariya sîstematîk a hêzên çekdarên rejîma Îslamiya Îranê li deverên sînorî ên Kurdistanê de, zarokek temen 15 salî yê bi navê Sam Hesenî bi teqeya rastewxwe hate kuştin û bavê wî jî bi dijwarî birîndar bû.

Li gorî raporta Rêkxistina Mafê Mirov a Hengawê, êvara roja Pêncşemî 18ê Pûşperê, hêzên henga sînorî li gundê Derekê yê ser bi bajarê Sewllawa, maşîna wê malbatê bi bê agehdarkirina berê dane ber destrêjiya guleyan.

Ew malbat piştî karkirin li nava baxçê xwe yê gêlasan, li dema vegeryana bo malê, li rê de bûne amanc.

Di vê bûyerê de Sam Hesenî, zaroka 15 salî bi sedema lêkeftina gule bi serê wî, demûdest canê xwe ji dest daye û bavê wî Ehsen Hesenî ranê wî birîndar bûye û niha li nexweşxaneya Bû Elî a Merîwanê li jêr çavedêriyê de ye.

Teqekirin li welatiyan û zarokan li nava baxên werzêrî ên xwe de, binpêkirina aşkere a mafê jiyan û peymannameya cîhanî a mafên zarokan e.

Berdewamiya wan cure cinayet û tawankariyan û bêdengiya sîstema bi nav Dadweriya rejîmê, nîşana vê rastiyê ye ku ew êrîşane netenê xeletiya kesekî, belkî siyasetek sîstematîk bo tirsandin, tepeserkirin û lêstandina mafê jiyanê ye li xelkê Kurdistanê.



## Kolberek xelkê Serdeştê li Sewlawa yê hate kuştin

Li gorî raporên saziyên mafê mirovî, li deverên çiyayî yên di navbera Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de, kolberekî ciwan xelkê bajarê Serdeştê bi teqeya rasterast ya hêzên rejîma Îranê hate kuştin.

Li gorî rapora Saziya Mafê Mirovî ya Hengawê, ev kolberê ciwan ku navê wî Zanyar bû, dema ku li bilindahiyên gundê Derekê yê ser bi bajarê Sewlawa (Hewraman) kolberî dikir, bi teqeya rasterast ya hêzên rejîmê hate kuştin.

Li gorî agehiyan di demjimêrên destpêkê yên sibê zû ya îro, Çarşemî 24ê Pûşperê, hêzên binkeyên sînorî yên Komara Îslamî ya Îranê ku li sînorê Sewlawa cih girtibûn, teqe li komeke kolberan kirin ku di encamê de, kolberekî ciwan bi navê Zanyar demûdest canê xwe ji dest da.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (522)

